# destpêkên şevînê

m.zîlanî



helbest

APEC

# DESTPÊKÊN ŞEVÎNÊ

## M. ZÎLANÎ

**Weşanên APEC**

**No: 54**

# DESTPÊKÊN ŞEVÎNÊ

## M. ZÎLANÎ

HELBEST

© APEC-TRYCK & FÖRLAG

Spångavägen 345
Box 3318
S-163 03 Spånga / Sweden

Tel: 08-761 81 18
Fax: 08-761 24 90

**ISBN: 91-87730-54-5**

**1994**

**Weşanên APEC**

**M. ZÎLANÎ**

# DESTPÊKÊN ŞEVÎNÊ

## HELBEST

Berg û nîgarên Dîwanê

Nîgarvan: Spîndar

- Diyarî bo:

- Xwîşka min "Stêr" ...
ya geş li ezmanê Kurdistan,
- Xwîşka min "Newroz" ...
cejna Welatê min,
- Birayê min "Tîrêj" ...
ronahîya roka azadîyê,
- Birayê min "Berzan" ...
hemdemê Zagros û Ararat,
- Birayê min "Jîro" ...
hogirê Zanyar û evîndaran.

- Hem diyarî bo: Jinbava min (dayika min)
" Şukrîye "
buhatirîn mirov li ber ...
çavê min.

## WIYANA WELAT

**Hêsir ji hewrên reş dibarin**

**tête bîrim xan û man**

**Baran ji çavên min dibarî**

**bê te mam bê xwîn û can**

**Dûrim ji baxên dil bi maxan**

**bûme warê êş û jan**

**Finda li ber arim bi çaxan**


**bo te mam bê jîn û şan**

**Her bo te ev nalîn ji min têt**

**bo te tim qîr û fîxan**

**- - -**

**Gulan, 1988, Amûdê**


12
9
3
6

# DESTPÊKÊN ŞEVÎNÊ

## ( I )

Mest û bê war
Cana
Bê heware
Çardeh gulên
Mîna rojên heyvê
Li ezmanê
Wan ebrûyan
Şahnamene
Li qonaxên wan
Girr û rivîn
Ji ber şûrên
Kuh û zingargirtî
Devên birînên newalan
Pûç dikin û
Didirrînin
Mest û bê war

( 2 )

Keserekê
Wek bayê dîlana " Zorba "
Dişîne zozanan
Dikeve nêv
Kangeha mest
Guhê XELAT
Sergerdan û
Bê war dike
Wek ŞIRÎNA
FERHAD
Bûka hevraz û nişêwan
Kanîn hevrazên te?
Kanîn nişêwên te?

( 3 )

Şakend
Winda bûne

Li asoyan
Wek stêrên efsanan
Kevn û
Dem buhurî
Ji xwîna çav
Bûne kendav
Wek lehengên dasîtanan
Dizîvirin
Bêyî hatîn
Li dil dixin
Tîşikên yadgaran
Wek şûrên keyan û
Zalan

( 4 )

Herrifîne
Dîwarên damaran
Ji ber êrîşên zimanan

Dil gudaze
Wek finda vêxistî
Bê yar
Bê hevale
Xwe tenê dişewitîne
Gazî dike
Tenê ...
Çi bikim ji ronahîya
Bendîxanên
Bi dar û berhem û
Ava çemman ?
Ku ew dijwartirin
Ji deyhemên
Ku rehên jar
Girêk dikin

( 5 )

Birûsk

Û topên sitemkar
Bi ser zerzenga sipî de
Wekî baranê dibarin
Di mehên zivistanî de
Bo çî ?
Mertalê te nîne
Bo kê ?
Herdu lingan
Mest davêje

( 6 )

Tazî
Li ser bedena te
Ya bûkane
Naperûçkên hoveberan
Şadîmanan
Digerînin
Di nêv bayê şevînê de

Te dilerizînin
Mêw û berhemên te
Ji kê re dimînin ?

( 7 )

Nivîngeha
Wêneyê te
Li ser afirandî
Ji bîhokan
Ji sêv û kanîyan
Dagirtîye
Ji negarvanan re
Kevalek bi xemle
Tazî
Û bê xişre
Kanîn ew xişrên te ?
Kanîn ew xişrên te ?

( 8 )

Cana
Kî te diparêze ? ..
Yara
Kî te dicû ?
Kînin yên ku
Te diparzinînin ?
Ji bilî Bilbilê
Dev bi gem û
Baskokirî
Kesek te nabîne
Heyvên cîhana te
Sorkirîne
Kevtine ber
Devên Nehingên kenaran

( 9 )

Giyayê kesk naxwin
Ji bilî laşên rût

Û serên xewnedar

. . .

Gerdenên Bilbilan
Diteqînin
Wek moşekan
Li ser baskê deng û
Bi lingên wî yên jar
Diçin heyvê
Bûngada lawazan
Dipîvin û
Şad digerin
Li hesaran

. . .

Her yê te ne xake
Ne ezmane
Rindek jare
Ji şarê " LARSA " ye

Bê xake her
Bê ezmane

. . .

Avdar 1992

Zawîte

## KIRASÊ MINALEKÊ

Li Bakur
Dengê te
Li asîmanan
Guhek tenê vedikir
Serîyek tenê
Pêl dikir
Durvê te
Di geşta te de
Li bajarên pir bilind
Dibû leylana
Temen buhurî
Wek kirasê te yê sor
Her dil vêl dikir

. . .

Li pişta dayika xwe
Rêl bi rêl
Kaş bi kaş

Derbeder dibû
Firmêsk wekî " Hîzil " û
Xabûr û Ferat
Hemî der û şop
Kêl dikir

. . .

Ji Başûr
Ji pişta dayika xwe
Wekî ba
Ji êşan dibezîya
Geh
Berbî Rojhilat ve
Geh
Berbî Bakur
Cîhan hemî ji ber te
Kevtin Keyxanên bilind
Biryar dan

Ew kirasê sor
Hilgirtin
Kirin AL
" Lê ji te kirin "
Di hemî dergehan de
Çikandin

. . .

Xistin destên xwe
Sermiyan û dar û ber
Lê dema
Rengê sor li ber ba kevt
Zîvirî
Hemî Keyxan hatin xwar
Hemî Peyman rûxiyan
Ji ber ku

. . .

. . .

Bi jehrê
Hatibûn nivîsandin

. . .

Çille 1991

Batova


# WELATO

Dilê min
        Derya cîhana te ya kûre
                Û bê binîye
Dilê min
        Bûngadek bê dawî û dûre
                Û bê sinore
Dilê min
        Seraya Şahînîya Kurde
                " Tu tê de Şahî "

. . .

Tebax 1989

Amûdê


N
W
E
S

# GIRÎYÊ TE

Hêsrek
Ji çavê te
Ku bi ser Zozanê
Rû yê te de
Wek gulekê
Dixindirî

. . .

Wek gulekê
Ji dara xwe
Diweşîya
Û dimirî

. . .

Dilê min jî
Bo te

Li panava
Evê sîngê

Disincirî
Disincirî

. . .

Çirîya pêşîn 1991

Heseke



# BINIVÎSE

Naveroka evê xamê
Xwîne
Reh ji dile
Ser ji ebrûyên çavane
Rûpel
Ji pelên daran û
Bêgunehîya Zarokan
Û vîna xort û çelengan
Û ji dêmên dilberane
Êdî bi kull binivîse
Binivîse

. . .

Bi evî şûrê evîndar
Wek bilûrê
Zîvar-zîvarî bike weş û
Pêjnên mirov

Li her derê
Bi ewî ebrûyî
Xêzên bi şan
Negar bike
Li ser wan rûpelan
Û ji xwîna evî dilî
Her bi evê diwîtka sor
Binivîse
Binivîse

. . .

Heger li ser rûyê xakê
Ewan xêzan
Bikişîne
Yan li ser pêlên deryayan
Li ser perçeyên reş
Û hewrên sipî
Yan li ser ezmanan

Herdem bi nalînî
Binivîse
Û bi dengên Bilbilan re
Her bibêje :
" Cana, were, vaye
Dinivîsim
Bi canhêjî
Bo te xwezîya dilê xwe
Kezeba min
Têt tivandin
Wekî findê
Têt sûjandin
Lê ji te re
Hê jî dinivîsim
Dinivîsim "

. . .


Weha

Li ser derdên min û
Ewan
Ji boyî Jîn
Û mafan û
CANA
Herdem binivîse
Herdem binivîse

. . .

Rezber 1989

Amûdê



## HEY RONÎ

Demekê tu hat
Û amade bû
Ji boyî HURMIZ
Te hêtûn veda
Şûna efsanan
Bi te hate der

. . .

Evîn dikenîya û dilîst
Û dibezîya
Sema û şadî
Hemî dijûn dişiştin

. . .

Stiranek
Tenê bû
Dilberek
Tenê bû

Lê di baxan de
Sed buhiştên ku
Tenê bûn
Tenê bûn

. . .

Ewê demê tu
Hatibû
Ji boyî HURMIZ
Te cîhan hejand
Hemî efsane
Revîyan
Ji ber wan tîrêjên te
Ji ber agirê
Ku ev roj binî
Tev bûye Arî
Erê tev bûye Arî

. . .

Bûye şevek sar
Û tarî
Şevek bê mehtav
Tije nalenal
Gazin û gazî
Hinavên birsî
Û laşên tazî
Bê mihrevanî
Kanê tu ?
Li kud maye tu ?
Bo çî nema têt ?

. . .

Hey ronî
Hey Azad
Min divêt bo te
Bistirêm
Şev bi şev

Stêrikên rê ya
KADIZA
Wan bihejmêrim
Şev bi şev
Boyî  te bigihêjim
" Nirvana "
Boyî te
Gorîkim
Dil û rewanan
Lê her ne ez dimirim
Û ne jî tu dimirî

. . .

Tu dê bêt
Û ji kelekên deryayan re
Bibêje
Ku :
" Ez tim dibim hemareng

Lê tu herdem rengeke
Rengeke "

. . .

Tête bîra te
Demekê
Te hêtûnek veda û da û da
Ji boyî HURMIZ
Ji boyî Xweda
Yê ku Teylesan danî
Ji ber bayê EHRÎMEN
Ew bayê dijwar
Dawî xwe ji ber veşart
Ma veşartî ta niha
Ma cuda

. . .

Hey ronî
Hey Azad

Gelo em li kî deverêne ?
Li ser evê Zemînê
Cihê me kî derêye ?
Heger nizane
Em yên dizanin
Lê bawer dikim
Ku tu ew zanayeke
Ticar nabêje
Dizanim

. . .

Şareyarek bo te bûye bendewar
Yek zigurd û berdîwar
Hinek dil tije azar
Û dildar
Hemî li ser rêça te CANA
Pel û darin
Her " Pelûdarin "

. . .

Şev bi şevan re
Dibûre
Min jî kevirê Aram
Danî şikefta Jînê
Nêzîkî çemmê ARAS
Kevtim şevînê
Kevtim şevînê

. . .

Min digot
Û digot
Ji dev gotin rêz dibûn
Cot bi cot
Ta ronî
Ta ronî
Di Rojhilat de hilat
Ronîkir
Serên daran û

Çiyayan bi Zerzengkir

. . .

Şeva tarî çû
Çiraya hêvîyan hat
Tîpên beyanî
Dîsan rêz dibin
Di newalan de
Lê
... .....
....... ..
Êdî ma ku hew biçe
Yan bi soz her vegere
Hey ronî
Hey Azad

. . .

Tîrmeh, 1988

Amûdê,



## WANA DILOVAN

Ji êşa
Evîna manga şevê
Rehên dil
Dibin bilûr bo
Şivanan

. . .

Wek ZENDEVISTA
Ji nîvê rûpelên dîrokê
Xwe çeng bike vir
Û bikeve hembêza
Wan Gulistanan

. . .

Xweş têtin
Karwanên wekî stêran
Wek sîpahên KEYAXSAR
" Neynewa "

Li ber lehîya şûran
Kirin Bûk
Û sazên ji dûr
Nalandin
Nalandin

. . .

Tu hey derdê bê derman
Weha bimîne
Sergom û bêzar
Ji ber ku
Dizanim
Xewa te nayê
Li bajarên bê kavil

. . .

Mêze bike li hawêr
Jiyan didirre
Li ser diyaran

Ji êşan
Te dît porê dilberê
Dibe daristan
Ji êşan
Te dît çemmê bi kovan
Dibe kezîya
" Wana dilovan "

. . .

Gola tev bi xwîn
Tije kîn
Hemxakê Sîpan
Ticaran
Kes ji hiş nabe
Ewan yadgaran

. . .

Çirîya pêşîn 1987

WAN

## KENARÊ ÇAVAN

Ave ev
Li nêvbera min û dûrîyê
Û bê kelekim
Zerzenga zêrîn
Kirasê pel zer
Li ber çav
Dibe dav
Li ezmanan digere
Dikene
Nizanim
Ji dile an na
Geh xwîşke
Û geh dilbere
Ave ev
Li nêvbera min û dûrîyê
Û bê kelekim

Sûlave
Ji ber bayê wê
Têtim hejandin
Wek belgên daran
Ew roka
Li gerîneka
Çavên bi pertew
Her derê
Dişewitîne
Agire ?
Yan Ave ?
Li nêvbera min û dûrîyê

. . .

Tîrrmeh 1992

Zaxo

## DEMÊN GIRIFTARAN

Ji kûranîya dil
Xêzên evîna xwe dinivîsin
Bi ava jiyanê

. . .

Şehlîlên baxane
Wek Bilbilan
Ji tîbûnê bê war dibin
Ji bê warî herdem tîne

. . .

Li ser axa
Doh agir bû
Dibin agir
Ji ling ta mil

. . .

Her keserên

Ji gerdenan
Ku der têtin
Mînayî keserên
" Giriftaran "
Yên ku di ser
" Pira keseran re "
Derbas dibin
Dibuhurin
Dil bi kullin

. . .

Li paş wan dimînin
Hemî yadgar û hevalîn
Lê li pêş wan
Her dimînin

Şop û xêzik
Û hevalîn
Û stiranên
Ku li ber Gul
Û li ser Gul

. . .

Tebax 1986

ŞAM

# DI RÊ DE ÇAV DIDÎT

Gelî gazîyan dişînin
Lê guh kohin
Çemm bê rêbaz
Diherikin
Wek xama nezanan
Awazên gerdenan
Nagihêjin ezman
Xurist bûye lehî
Lê herwekî kerre

. . .

Ev rewanê bê laş
Li nêv babelîskan

Bê war dibe
Bê nav dibe
Gazîyan dişîne
Lê Bûngad laşekî
" Her bê cane "

. . .

Cehzeran 1990

Heseke

# KEVIRÊN LAŞ

Diherrifin
Wekî koşka
Kavilbûyî
Wekî axin
Di evê jînê de
Wekî daxin

. . .

Li hember suhna te ya ku
Wekî roje
Vedijenin
Û ji werêva dil
Dirijînin

Iksîr û meya " Aferîn "
Û di nêv jîna te de ya
Wekî doje
Digerînin
" Jîna xwe tim digerînin "

. . .

Cehzeran 1991

Helep

## NAMEYEK

Ey nazdara min
Ji bajarê kavilan
Bo te dişînim
Silavan
Bi firmêskên germ
Xêzên sor dinivîsim
Ji wan xuncan re
Şahîya bê nav
Keserên bê ba

. . .

Hesar û stêran
Ji ezmanan dihênim
Ser evan rêzan
Bo bibin surme
Li dor wan
Herwekî

Xişrên ser sînga Zînê
Biçirisînin
Bo ku xuyanî bibin
Azarên bê deng
Birînên bê xwîn
Kujtina bê ceng

. . .

Ev hemî
Li ser evê kaxeza
Wekî neynikê
Em hemî
Tê de xuyane
Li me rev û bazdane
Geh ji ber bomban
Geh ji ber peyvan

Ji ber pêlên deryayan
Bê dawî

. . .

Avdar 1988

Qamişlo

## BOGEVEK GERMÎÇANKÎ

Pel bi hevre kom dibin
Bendewarên agirin
Bendewarên bahozek
Dînomînîne

. . .

Lê
Hê jî pelên min
Parvekirîne
Li zoman
Û li newalan
Li nêv enî û sîngê
Navêna herdu çavan

. . .

Ewê di banemêrê de bifirrin
Berev jora çiyan ve
Berev kohan ve

Ne parvekirî
" Li hev civandî "
" Li hev rêsandî "

. . .

Ewê ji şikeftekê
" Kardoxîn "
Bifirrin
Berev jor
Ji nêv bayekî
Bi sond û
Bi peyman
Wek bogevekê
Binîka wê bi rehên
Dar û çemman ve
Girêdayî ye
Serikê wê her rojan
Mêvane

Li paytextê " Gelawêj "
Û pê re
Digere
Û bi " Behram " re
Durişmên sor hildide
Roj bi roj
Diçin kohê evînê
" Evîna dagîrkirî "

. . .

( Koh gazî agir dikin
Bi dîlan
Û pêrgî agir dibin
Pê re dibin yek
Û naşewitin
Dibin ROK
Û Rojek der têt )

. . .

Gulan, 1988

Qamişlo

## PEYVA HINAV

Hemdemê canê min
Werêva dil
Min ji te pir gazin hene
Herweha bo te nexoşim
Timî gêjim

. . .

Ji nîvê pingava te ez
Derdikevim
Bo çî bê mihrevanîye ?
Pirs her li cem te ye
Û hem bersiv
Cerg û xwîna
Min dimije

. . .

Hemdemê xwîna min
Kevçika dil

Êdî hew min
Daneyîne
Ser terazû
Min bi mihrîyê bipêçe
Hew carekê tenê
Dev ji pergalê min berde

. . .

Pir dinalim
Li ser awazên te
Bê ku dengek
Ji gerdena
Minî wêren
Bi rê ya şahîyan
Bêt gerandin

. . .

Ji ber agirê te
Her rojekê

Sedên caran
Dikevim dojeha
Azarîyan
Laş û rewan
Dikevin ber
Xeşm û mîxan
Û derzîyan

. . .

Dikevim û
Dîsan jî radibim
Dikevim û
Her radibim
Ma li asoyê te
Şahî neman ?

. . .

Sengerê min
Herkes bêhna gulan

Bêhn dike û
Dikêşîne
Ê min bêhna gulan
Dixwînim û
Diheyvêzim

. . .

Tenê
Min hêvîyek ji te
Heye
Hinavê min
Wekî kezîyên dilberan
Rind bihûne
Dibe ku ew
Hesinên kolankar
Ji hinavê min derkevin

Herwekî Agirvejanek
Gûrr vepaşe

. . .

Çirîya paşîn 1989

Heseke

# ÇAV NEGIRTÎ

Tenha
Şev bê xwedî
Hewar diponijin
Di hinavan de
Gazî
Bi cih dibin
Lê wek lalan
Ji dest diçin çek û lavij
Can dimînin
Bê sermiyan
Iaş dibin sêv
Li panavên tarî

. . .

Çiya
Li kolînkan siwar dibin

Tev li daran
Wekî " Sîzîf "
Hildikişin
Sîng têtin çemandin
Hildikişin û diçin
Radibin û
Çav zû nayên girtin
Heta çûn jor
Hê jî li jêr mêze dikin

. . .

Xew nabe mêvanê
Çavan
Li ber ronîya kor
Û li ber şemalên
Bê can

. . .

Tenha

Tenhaye nalîna
Bilûra jar
Ya li ber çavên negirtî
Bi azare
Dibêje : looo
Wey looo wey looo

. . .

Kûrin
Newalên çav
Lê ne korin
Dibe
Ji girîyê
Pêr û doh û
Ev roj
Sorin
Dilop dilop
Hêsir ji wan dibin cobar

Winda dibin
Di tarîşevan de

. . .

Rezber 1990

Qamişlo

## ÇÛNEK DÎTIR BI BILBIL RE

Fîxana Bilbil herijand
Ev dilê herdem herijtî
Ku dîsan bûm rêwî
Berev bilind cîyan
Li newalan
Berev çiyayên dûr
Li welatan
Berev dilbera yekemîn

. . .

Ewan awazên lal
Çendî bêzar kirim
Bûm hevalê
Bayê zivistanan
Birim Sîpan û Zozanan
Û maçek ji

" Nesrînên Ararat "
Diyarî min kirin
Bû yadgarek li rû Zemîn

. . .

Raz peyabey
Diyar dibûn
Evînî bûn
Wan bi gulîyên darên ZAXO re
Distiran û
Bi destokên ba re
Kaxez ji KERKÛKÊ
Dişandin û
Her dişandin
Ji SENENDACA deman re
Ji MEHABADA xeman re
Ji boyî dilê min jî her
Derd û birîn

. . .

Vegerîyam
Di ber kêleka Diçlê re
Ta Çavîka Dîwar
Dîsan ji nû ve dijjî sinoran
Hatim xakê
MÎTAN
Û SOBAR Û
XABÛR
Li ser dengê Bilbil
Di bêzarîya xwe de ya
Bê ti sinor
Mîl û mîl her
Digerîyam
Laşê min tije şewate
Tije rivîn

. . .

Çûnek bû çû

Lê dema çûnek dîtir hat
Ev çûna temene
Jiyana min
Digerîne
Dirijîne
Ji kortika çavan
Baranên WAŞOKAN
Û berfên zozanan
Tev li cihên
Afirandar
Û dasîtanên bapîran
Yên li ZAGROS
Û li BERZAN
Li warê " MEM û ZÎN "

. . .


Azarên min
Dawîya wan nayê

Ta piştî mirinê
Çûn û hatinên min
Ti deman rett
Nabin
Ta bi dawî bibe rojgar
Û rojgar jî
Bê dawîye
Bê dawîye

. . .

Banemêr 1988

Serê Kanîyê



## NEXŞEYA KURDISTAN

Hemî gava
Di dil de û

li ber çava

Wêneyên te
Koh û deştin

sîberên te

Li pingava
Dibin ZERDEŞT

û ticaran

Naçin ava

naçin ava

. . .

Avdar 1988

Efrîn

Şev bi şevan re
dibûre
Min jî kevirê Aram
danî şikefta jînê
Nêzîkî çemmê ARAS
Kevtim şevînê
Kevtim şevînê

**ISBN: 91-87730-54-5**

**APEC**